

Hejmara - 189

Bê dirave

# MIZGÎN

1 Tebax 2025



# Naverok

1 Wênesazî

2 Wêjeya Zarokan

3 Lîsk

4 Welatê me

5 Tu dizanî

6 Tendirustî

7 Tîp û gotin

8 Navdar

9 Bexçeyê Navan

10 Jîngeh mala me ye

11 Jêhatiyên Zarokan

12 çîrok

16 Bixwînin û fêr bibin

17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê  
Amir Ferso

Dîzayn  
Mecid Alsadûn

Şêwekar  
Umer Ishaq  
Xalid Bîco  
Baran zagros  
Rojhilat

Sererastkirina Kurdi  
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî  
Abdulah Rehîl


Instagram Kovara Mazgîn

Facebook Kovara Mazgîn مجلة مزكین



Ji bo xêzkirina kulîlika Şilêr  
gavên li jêr bişopîne.

اتَّبِعِ الْخَطَّاتِ التَّالِيَةَ لِرَسْمِ زَهْرَةِ  
شَلِيرِ.



# Dayê

*Dayê dayê lê dayê  
Dilovanê hêjayê*

*Şîr û vîyan te da min  
Hejandî landika min*

*Lorandina te saz e  
Dengê te xweşawaz e*

*Hembêza te buhişt e  
Bîna gul û surişt e*

*Tu ranazê ji bo min  
Derman dikî êşa min*

*Min fêr dikî jiyane  
Mamosteyê rêzanê*


*Qurban bim ez sed carî  
Dil ji bo te diyarî*

Imran Yûsiv



ALÎKARIYA MÊŞA HINGIV YA ÇALAK BIKE JI BO  
BIGHÊJE KULÎLIKA XWEŞIK

ساعد النحلة النشيطة بالوصول  
الى الزهرة الجميلة





## Neqşeya Bêstûn

Neqşeya Bêstûn li Rojhilatê Kurdistanê, nêzikî bajarê Kirmaşahê ye û zêdetirî 2500 sal in ku ew beşek ji mîrateya herêmê ye.

Kurdên li Rojhilat bi vê nîşana arkeolojîk a mezin ku li ser axa wan e, serbilind in. Nivîs bi sê zimanên kevnar hatiye nivîsandin: Farisiya Kevî, Elamî û Babîlî. Ev dîmen dişibihe çîrokeke ji serdema padîşahan, lê li ser kevir hatiye neqîşandin!

Neqşeya Bêstûn di sala 2006'an de ket Lîsteya Mîrata Cîhanî ya UNESCO'yê.

Tevahiya herêmê tijî şikeft û cihên kevnar e ku mirov bi hezaran salan lê jiyane, ji ber vê yekê ew ji bo dîrokê cihekî girîng e.



## نقش بیستون

يقع نقش بیستون في روج هلات كردستان، بالقرب من مدينة "كرمانشاه" ويعد جزءاً من تراث المنطقة منذ أكثر من 2500 سنة. والکرد في روج هلات يعززون بهذا المعلم الأثرى الكبير، الذي يوجد على أرضهم، والنقش مكتوب بثلاث لغات قديمة: اللغة الفارسية القديمة، واللغة العيلامية، واللغة البابلية. ويبدو المشهد، وكأنه قصة مصورة من زمن الملوك، لكنها منقوشة على الصخر!

تم إدراج نقش بیستون على قائمة التراث العالمي لليونسكو عام 2006 م.


المنطقة كلها مليئة بالكهوف، والمواقع القديمة، التي عاش فيها الإنسان منذ آلاف السنين، لذلك تعد مكاناً هاماً للتاريخ.



Tu dizanî çima kîvroşk xwe çem dike?

Ji ber ku kîvroşk mîna me namesîn, lê belê lingên wan ên paşîn ên dirêj û bihêz hene ku alîkariya wan dikin di çemkirina bilind û bi lez de, ev yek alîkariya wan dike ku ji rovî û bazan birevin!

Dema kîvroşk xwe çem dike weke ku dilîze xuya dike, lê di rastiye de, ew tevgerên jîr bikar tîne da ku xwe biparêze! Herwiha çemkirin alîkariya wê dike ku di daristanê de bi lez û bêdeng tevbigere.



Tu dizanî?

هل تعلم؟

هل تعلم لماذا يقفز الأرنب؟

لأنَّ الأرنب لا يمشي مثلنا، بل يملك أرجلاً خفيفةً طويلة، وقوية؛ تساعدُه على القفز مسافات بعيدة وبسرعة عالية، وهذا يساعدُه على الفرار من الثعالب والنسور!

وعندما يقفز الأرنب، يبدو وكأنه يلعب، لكنَّه في الحقيقة يستخدم حركة ذكيَّة لحماية نفسه! كما أنَّ القفز يساعدُه على التحرك في الغابات بسرعةٍ وهدوءٍ.



# Tenduristiya te gencîneyek e... û hejîr jî hevalê te ye

## صَدِّكَ كَنْزٌ... وَالتَّيْنُ صَدِيقُكَ

Ma tu ji hejîran hez dike? Ew mêweyê xweş û şîrîn e. Ew ne tenê xweş e, lê di heman demê de ji bo tenduristiyê tijî sûd e.

Ji bo pergala helandinê pir girîng e, ji ber ku tê de rîçalên xwarinê hene ku alîkariya gedeyê di helandina xwearinê de dike û parastina ji qevzîbûnê dike.

Vîtamîna A, B û C dihewîne.

Ji ber ku ew bi kalisyom û megnîzyom zengîne, alîkariya bihêzbûna hestî û diranan dike.

Jîrbûn û baldariya te zêde dike, ji ber ku madeyên ku bijeyeniya mejî dike dihewîne.

Lê hevalno: zêde hejîran nexwin, dibe ku dema hûn zêde bixwin zikê we biêşe.



هل تُحِبُّ التَّيْنَ؟ إِنَّهُ فَاكِحَةٌ لَذِيذَةٌ وَحُلْوَةٌ، لَيْسَتْ فَقَطْ شَهِيَّةً، بَلْ هَلِيئَةٌ بِالْفَوَائِدِ الصَّحِيَّةِ الْمُفِيدَةِ. وَهُوَ ضَرُورِيٌّ لِلْحَضَمِ؛ لِأَنَّهُ يَحْتَوِي عَلَى أَلْبَانِ غِذَائِيَّةٍ تَسَاعِدُ الْمَعِدَةَ عَلَى الْحَضَمِ، وَتَمْنَعُ الْإِمْسَاكَ.

فِيهِ فَيْتَامِينِ A وَ B وَ C.

وَيَسَاعِدُ فِي تَقْوِيَةِ الْعِظَامِ، وَالْأَسْنَانِ؛ لِأَنَّهُ غَنِيٌّ بِالْكَالْسِيُومِ، وَالْمَغْنِيسِيُومِ.

يَعَزِّزُ تَرْكِيزَكَ وَذَكَاءَكَ، لِأَنَّهُ يَحْتَوِي عَلَى مَوَادِّ غِذَائِيَّةٍ لِلدِّمَاغِ.

وَلَكِنْ يَا أَصْدِقَاءَ:

لَا تَفْرِطُوا مِنْ تَنَاوُلِ التَّيْنِ، لِأَنَّهُ حُلْوٌ جَدًّا، وَقَدْ يُسَبِّبُ مَغْضًا عِنْدَ الْإِكْتِرَارِ مِنْهُ!

أُضِدِّقَائِي الْأَعْزَاءَ، أَكْمَلُوا الْحُرُوفَ النَّاقِصَةَ؛  
لِتُكْمَلُوا الْأَسْمَاءَ حَسَبَ صُورِهَا.

ا

ن

خ

ض

ر

و

ا

ت

## Helbestvan Bextiyar Zîwer

Li bajarê xweşik ê Silêmaniyê, Bextiyar Zîwer di sala 1908'an de di malbateke ku ji wêje û çandê hez dikir ji dayik bû. Bavê wî Abdullah Zîwer jî helbestvanekî navdar bû, Bextiyar di nav pirtûk û gotinên xweş yên wêjeyî de mezin bû.

Helbestvan Bextiyar Zîwer di sala 1952'an de, di 44 saliya xwe de koça dawî kir, lê bandora wî di dilê gel de zindî ma û ew li bajarê xwe yê delal, Silêmanî, hat veşartin.

Dema ku ew 17 salî bû, dest bi nivîsandina helbestan kir, gotinên wî evîna wî ji bo welat û gel diyar dikir.

Li kêleka nivîsandina helbestan, wî çîrokên kurt jî nivîsand. Dîwaneke wî ya helbestan a çapkirê heye, gelek helbestên welatparêzî dihewîne û kesê ku wan helbestan bixwîne xwe serbilind hîs dike.



## الشاعر بختيار زيور

في مدينة السليمانية الجميلة، وُلد بختيار زيور سنة ١٩٠٨، في عائلة تحب الأدب والثقافة. وكان والده أيضاً شاعراً معروفاً اسمه عبد الله زيور، فكبر بختيار وسط الكتب والكلمات الجميلة. عندما كان في عمر ١٧ سنة، بدأ كتابة الشعر، وكانت كلماته تعبر عن حب الوطن والناس. ولم يتوقف عند الشعر فقط، بل كتب القصص القصيرة، له ديوان شعري مطبوع، وفيه الكثير من القصائد الوطنية؛ التي تجعل القارئ يشعر بالفخر والانتماء. توفي الشاعر بختيار زيور (١٩٥٢)، وكان عمره ٤٤ سنة، لكن أثره بقي حياً في قلوب الناس، ودُفن في مدينته الحبيبة السليمانية.

# Hin Navên bi tîpa -A

**Arîn**

**Ahîn**

**Arîwan**

**Ala**

**Aryos**

**Alaz**

**Ara**

**Aras**

## Bibe hevalÊ firindeyan

## كن صديقًا للطيور



Hevalno, firindeyên biçûk jî mîna me fi dibin. Bi taybet di rojên ku germahî zêde be yan av li xwezayê nebe. Ji ber wê avê bixin firaxekê û li bexçeyê mala xwe yan li ser banê mala xwe deynin.

Ev tiştê hêsan ku we kiriye alîkariya firindeyan dike di:

Vexwarina avê, paqijkirina perîkên xwe û parastina paqijiya xwe. Herwiha av parastina tenduristiya wan jî dike.

Hûn dizanin hevalno, gava hûn alîkariya firindeyan dikin, hûn beşdarî parastina jîngehê dibin, ji ber ku firindekêzikan dixwin û alîkariya tozkirina kulîlikan dikin?

يا أصدقاء، إنَّ الطُّيُورَ الصَّغِيرَةَ تَشْعُرُ بِالْقَطِيشِ مِثْلَنَا. خَاصَّةً فِي الْأَيَّامِ الْحَارَّةِ، أَوْ عِنْدَمَا لَا تَجِدُ مَاءً فِي الطَّبِيعَةِ. لِذَلِكَ، ضَعُ طَبَقًا صَغِيرًا مِنَ الْقَاءِ فِي حَدِيقَةِ بَيْتِكَ أَوْ عَلَى شُرْفَةِ الْمَنْزِلِ. وَهَذَا الْفِعْلُ الْبَسِيطُ يَسَاعِدُ الطُّيُورَ عَلَى:

الشَّرْبِ فِي الصَّيْفِ، وَعَلَى تَنْظِيفِ رِيشِهَا، وَالْبَقَاءِ نَظِيفَةً، وَالْمَاءِ يَحَافِظُ عَلَى صِحَّتِهَا.

وهل تعلمون يا أصدقاء، عندما تساعدون الطُّيُورَ، فإنَّكم تساهمون في حماية البيئة، لأنَّ الطُّيُورَ تَأْكُلُ الْحَشْرَاتِ، وَتَسَاعِدُ فِي تَلْقِيحِ الْأَزْهَارِ.



## Silav hevalno:

Ka em hevala xwe **Nazdar Ebdunafi** nas bikin.

Stêrka biçûk Nazdar li gundê Dêrokevnekê yê xweşik dijî, di nava tiliyên xwe de jêhatîbûn û xewnek mezin, hilgirtiye. Nazdar li Dibistana Amadekar a Badiyanê dixwîne û pir ji xêzkirinê hez dike. Firçeya wê ya rengîn wêneyên xweşik xêz dike. Lê xewna wê ya mezin ne tenê li ser rengan e, ew ji dilê wê tê. Ew hêvî dike ku di pêşerojê de bibe bijîşka dil. Ji ber ku ew bi nexweşiya dapîra xwe pir bandor bû û hêvî dike ku alîkariya kesên nexweş bike. Dema ku wê di Dibistana Dêrokevnoke ya seretayî de dixwend, ew bi kesayeta 'Pezkovî' tevî şanoyekê bû û bi serbilindayî bi zimanê xwe yê dayikê rola xwe lîst.

## مرحباً يا أصدقاء

لنتعرفُ على صديقتنا نازدار عبد النافع

محمد

في قرية ديروكفك الجميلة، تعيش نازدار نجمة صغيرة، تحمل بين أناملها موهبة، وأمنية كبيرة. تدرس نازدار في مدرسة باديان الإعدادية، وتُحب الرسم كثيراً، فريشتها ترسم الرسومات باللون الجميلة.

لكن حلقها الكبير، ليس فقط باللون، بل ينبض من القلب؛ فهي تتمنى أن تصبح طبيبة قلب عندما تكبر، لأنها تأثرت كثيراً بمرض جدتها، وتحلم أن تساعد كل من يعاني مثلها. شاركت بشخصية "Pezkovî" في مسرحية مدرسية، عندما كانت في مدرسة ديروكفك الابتدائية. وقدّمت الدور بلغتها الأم بكل فخر.



Çîroka : Lîstina di xwezayê de xweştir e

Ez di lîstikê de  
gihîştim asta  
10'an.

Û min hemû xal  
berhev kirin!

Lê telefon  
xweştir e.


Çi nêrîna we  
ye em herin li  
bexçe bilîzin?

Lîstina di xwezayê  
de biceribînin, dibe  
ku hûn tiştêkî xweştir  
bibînin.



Hewa hênîk e

Û kulîkên xweşik li her derê ne.



Binêre ez çîqas bilez im!

Û ez ê hewl bidim ku gogê rawestînim!







Ramaneke baş e.

Çi nêrîna te ye ku em dema xwe ya rojane ya li ser telefonê kêmtir bikin?



Erê ji bo lîstika li xwezayê



Ger hûn bi xwezayê re dost bin, wê bextewarî û tenduristî her tim bi were bin.



Hesp

حِصَانٌ

Horse



Ker

حِقَارٌ

Donkey



Deve

مُدَرِّسٌ

Teacher



Ga

تَوْرٌ

Ox

# Çavika Mizgîn

## عدسة مزكين



# مزكیه

1 - آب - 2025

